



Bernameya Bicihkirina Mirovdostane

GUHERTINA XIZMETAN JI BER BELAVBÛNA NEXWEŞIYA KOVÎD-19'Ê

Raberkirina piştevaniyê di bin bernameya Bicihkirina Mirovdostane (Humanitarian Settlement Program) di serdema belavbûna KOVÎD-19'ê hema wisa jibo seredaneran pêkan e. Tevî vê yekê, gengaz e ku şewaza raberkirina xizmetan li gorî şîretên fermî yên Tendurustiyê were guhertin.

Ji kerema xwe jibo gotûbêja derbarê van tevdîran bi awayê rasterast digel **Raberkira Xizmetên HSP'ê** ya xwe bikeve têkilliyê.

Derbarê **KOVÎD-19'ê û nîşaneyên wê agahiyên bi dest bîne.**

Venihêrîna giştî

Bernameya Bicihkirina Mirovdostane (HSP) ji kesên ku bi riya Vîzaya mirovdostane derbasî vî welatî bûne, piştgiriya dike da ku pisportî û zanista pêwîst jibo ku bibin kesek serbixwe û çalak li civaka Australyayê, di xwe da pêk bînin.

Bernameya HSP'ê bi nûnertiya dewleta Australyayê ji aliyê raberkirên xizmetên diyarkirî li seranserî Australyayê va tê raberkirin. Beşdariya di HSP'ê da dilxwazî ye û xizmet bi riya stratejiya rêveberiya babetî li gorî hewcetiya tîr raberkirin.

Raberkirên xizmetên HSP'ê wek bingehek jibo bicihkirina serketî û bi mebesta sûdwegirtina seredaneran ji encamên têkildarî warên sereke yên jêrê, piştî wan digire:

- Karkirin
- Perwerdehî û fêrkarî
- Xizmetên zimanî
- Mal û mesken
- Rêveberiya Dirav
- Rihetî û saxlemiya bedenî û derûnî
- Beşdarî di civakê da û danîna têkilliyê tev kesên din
- Piştevaniya civakî û xebatên malbatî
- Dadmendî

HSP bi awayekî hatiye plandarêştin ku di kêleka xizmetên têkildarî bicihkirinê û bi awayê nasyar kar bikin. Ev bername bi awayekî ciddî bala xwe dide ser alîkariya bo seredaneran bo hînbûna zimanê Inglîzî û bidestxistina pisportiyên lazim di warê perwerdehî û karkirinê da û berçavgirtina vê yekê ku encamên pêkhatî di vî warî da jibo bicihkirina kesên ku bi riya Vîzaya mirovdostane derbasî welatî Australyayê bûne, alîkar in.

Lêzanînên têkillîgirtinê û cihên raberkiran xizmetên HSP'ê li **vir** in.

Xwedan-merc-bûn

Dema ku kesek yek vîzayên jêrê jibo bicihbûna dubare li Australyayê werdigire, Wezaretê karên navxweyî bi mebesta sûdwegirtina wan ji piştevaniyên HSP'ê piştî derbasbûna wan nav Australyayê, wan dişîne cem raberkireke xizmetên HSP'ê.

- Vîzaya Penaxwaziyê (Bin-koma 200, 201, 203 and 204); û
- Vîzaya Mirovdostane ya taybet (Binkoma 202) (ji billî kesên ku bernameya piuştevaniya civakê (Community Support Program) werdigire).

Xizmetên HSP'ê

Rêvebirên dosyeya HSP'ê jibo pêkanîna plana rêveberiya kesane û raberkirina pakêta xizmetan a li gorî hewcetiyan naskirî yên wan, hevkarîya seredaneran dikin.

Xizmetên piştevaniya pratîkî ya seretayî wek:

- Pêşwazî li balefirgehê
- Raberkirina malê û danasîna wê di dema gihîştinê da
- Amadekirina pakêta xwareka seretayî û kelûpelên pêwîst
- Alîkariya bo navnivîsandina li (Centrelink), Medicare û Bankê
- Çareserkirina hewcetiyan lezgîn ên paqijiyê
- Raberkirina destûrkirên têkildarî kiryarên pêwîst di rewşa awarte da û çawaniya sûdwegirtina ji xizmetên wergera devkî
- Naskirina xizmetên xwecihî.

Xizmetên din ên heyî jibo seredaneran piştî bicihbûnê pêkhatî ji van babetan in:

- Raberkirina bernameya nasyarkirina hundir-sînorf ku zanyariya seredaneran derbarê şewaza jiyane û nirxên gelê Australyayê zêde dike
- Alîkarî jibo peydakirina cihê jiyane yê demdirêj
- Piştigirî jibo bidestxistina xizmetên nasyar ên pêkhatî ji xizmetên piştevaniya malbatî û tendurustiyê
- Têkilliya digel çalakî û komên civaka xwecihî
- Piştevanî jibo nasnivîsandin di bernameya Ingîlîzî jibo koçbrên mezin (AMEP) û beşdariya di polan da
- Alîkariya bo navnivîsandina li polên fêrkarî û perwerdehiyê yên têkildar û pêderxistina pisportî û şiyane heyî beriya hatinê
- Alîkariya jibo têkilliya digel xizmetên karkirinê, bikaranîna stratejiyên karkirinê û sûdwegirtina ji xizmetên piştigiriyê jibo pêkanîna pêşeyekê.

Her wiha raberkirên xizmetên HSP'ê dikarin şandina daxwazê jibo werdigirtina xizmetên wergera bêpere (FTS) jibo seredanerên xwedan mercê FTS'ê ku nikarin bi awayê Online bişînin, hêsan bikin.

Derketina ji HSP'ê li gorî bidestxistina encamên guncan û baş ên têkildarî bicihkirin di cihê jiyana seredaneran da ye ku di plana rêveberiya dosyeya wan da hatine diyarkirin. Jibo pîrrianiya seredaneran, ev encam di heyama 6 heta 18 mehanda ji dema hatina wan bo Australyayê tîd bidestxistin.